Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1302 27-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Projeya nanê sêlê li Tirbespiyê aboriya jinê xurt dike

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Ji sala 2023'an ve li Tirbespiyê jin sê firneyên nanê sêlê bi hevkariya Aboriya Jin bi rê ve dibin. Rêveberiya Aboriya Jinê ya Tirbespiyê Xedîce Ibrahîm anî ziman ku armanca wan ji projeya nanê sêlê ew e ku jin bikaribin bi hêza xwe kar bikin.**

Projeya nanê sêlê ya Komîteya Aboriya Jinê ya girêdayî Kongra Star a Tirbespiyê ye, li bajarê Tirbespiyê firnên nanê Sêlê hene. Firna 8'ê Adarê, Firna Şehîd Jiyan û Firna Tirbespiyê firnên ku nanê sêlê çêdikin. Ji ber ku ev proje taybet a jinan e, jin nanê sêlê çêdikin û van firneyan bi rê ve dibin. Hêjayî bi bîr xistinê ye ku her sê jin di van firneyan de dixebitin. Derbarê projeya nanê sêlê û firneyên jinan, rêveberiya Komîteya Aboriya Jinê ya Kongra Star a bajarê Qamişlo, Xedîce Ibrahîm û nanpêja jin a bi navê Enûd Eldawûd ji rojnameya me re axivîn.



**'Armanc ew e ku jin bihêzdarî xwe bi rê ve bibin'**

Xedîce Ibrahîm anî ziman ku armanca wan ji projeya nanê sêlê ew e ku jin bikaribin bi vîn û hêza xwe kar bikin û wiha got: "Weke Komîteya Aboriya Jinê ya bajarê Tirbespiyê ji bo piştgirtiya jinan kar dike. Li ser vê bingehê jî me sîstema koperatîfê ji bo jinan da meşandin, bi taybet projeya nanê sêlê. Armanca me ji sîstema koperatîfê ew e ku em jinan bi hêz bikin û bikarbin xwe bi rê ve bibin. Sedema sereke ji meşandina sîstema koperatîfê ew bû ku jin bi destê xwe karekî wiha bike û mêran weke pişt ji bo xwe nebîne, ango divê jin ji bo mijarên aborî û jiyanî li ber mêran negere û xew hewcedarî wan neke. Di sala 2023'an de me dest bi projeya nanê sêlê kir, me sê firne bi dest xistin, her firneyek sê jinên ku bispor in di çêkirina nanê sêlê de. Di serî de me cih, rixseyên ard û mazotê ji bo wan amade kir, da ku bikaribin dest bi kar bikin."

**'12 ji sedî ji me re, ya din jî ji jinan re'**

Xedîce Ibrahîm diyar kir ku 12 ji sedî ji berhemê firotina nan ji Aboriya Jinê re û 88 ji jinan re dimîne û wiha domand: "Mercê tevlîbûna sîstema koperatîfê heye, divê her jinek nêzî 100 hezarên leyreyên Sûrî bide Aboriya Jinê. Li aliyekî din divê jin bizanibin nanê sêlê çêbikin û di çêkirina nan de bisporbin. Proje bi hevbeşî di navbera me û wan de tê meşandin, her heftî 6 kîs ard, 250 lître mzot ji bo her firneyekê tê belavkirin. Herwiha hin kel û pelên din hene mesref ji bo wan tê kirin. Bi giştî her roj lîsteya nanê ku tê firotin, ji me re tê, em lêçûnên mazot, ard, xwê û hwd… ji giştî di din aliyekî, piştre 12 ji sedî berhemê ji Aboriya Jinê re dimîne û pereyên mayî ji jinan re dimîne. Bihayê kîsê nan ku têde 10 nan hene bi 7 hezar leyreyên Sûrî tê firotin; li firneyên taybet yek kîs bi 10'an e, bihayê ku em pê difiroşin bi hemahengiya temwînê ye. Ev koperatîf desteke ji bo jinê û bi riya wê jin sûdê jê werdigirin, mehane û her jinek ji meliyon û 400 leyreyan heya meliyon û 700 dest heqê xwe digre, hêjayî bibîrxistinê ye ku her jinekê meha bûrî nêzî meliyon û 900 hezar leyre di encama xebata xwe de girt."



Xedîce Ibrahîm



Enûd Eldawûd

**'Sîstema koperatîfê destekeke mezin dide jinan'**

Enûd Eldawûd destnîşan kir ku sîstema koperatîfê destekekê dide jinên Tirbespiyê û wiha bi lêv kir: "Ji destpêka sala 2023'an min dest bi vî karî kiriye, em sê jin ji Tirbespiyê di firneya Şehîd Jiyan de kar dikin. Destpêka ku ez tevlî kar bûm, rastî gelek astengiyan hatim, lê bi vîna xwe min kar berdewam kir û stûna projeya xwe danî. Sîstema koperatîfê destekeke mezin dide jinan. Li vê firneyê jin her tiştî bi rê ve dibin, Aboriya Jinê jî destekê didin me, ew ard, mazot û hemû kelûpelên pêwîst ji bo me tînin. Em jî rojane tûrikek ard dikin hevîr û nêzî 800 nanê sêlê çêdikin. Şêniyên bajarê Tirpespiyê sûdê ji nanê sêlê werdigirin û dikirin, hem jî xwaringehên Tirbespiyê ew jî vî nanî dikirin, carcaran ji Girkê Legê jî tên firneya me."

**'Ev proje jêdera jiyana me ye, lê em astengiyan dibînin'**

Enûd Dawûd da zanîn ku projeya nanê sêlê ji bo xwerêvebirinê jêdereke, lê em astengiyan dibînin û wiha axivî: "Berî ku ez dest bi karê nanê sêlê bikim, rewşa me ya madî lawaz bû, eger zarokên min daxwaza tiştekî ji min bikiribana, min daxwaza wan pêk neanîbana. Lê piştî min kar kir, êdî ez bi hevjînê xwe re mala xwe bi rê ve dibin. Pereyên ku em werdigirin heya radeyekê têra me dike, di mehê de li gorî karê ku em dikin, encama keda xwe werdigirin, ev proje jêdereke serke ye ji bo me. Di destpêkê de kar gelekî zehemet bû, ji ber ku me bi destan nan çêdikir. Bi hevkariya rêxistina Aboriya Jinê me jenetorke û alava çêkirina hevîr ji bo xwe anî û me ew astengî derbas kir. Di werzê havînê de em astengiyên mezin dibînin, ji ber pileya germahiyê gelekî bilind e, ji hilma paporê ya germ em gelekî zehmetiyê dikşînin, carcaran ez ji ber vê germê dibêjim nema kar dikim, dîse ez dibêjim divê em bi vîna xwe li ber xwe bidin."

## FERHENGA BIWÊJAN

**LÎ SER NIYETA BAŞ Û KIRYARA XIRAB**

**Birhên min şeh dike çavên min kul dike:**
- Niyeta wî baş e lê tişta dike xirab e.
**Qaşo wê kil bikira kor kir:**
- Xwest tiştekî baş bike lê tiştekî xirab kir; xwesteka wî qencî bû lê bû xirabî.
**Wê kil bikira kor kir:**
- Bi heman wateyê.
**Xwest kil bike kor kir:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER MEZINKIRÎNA TIŞTÊN PIÇÛK Û TIŞTA HERÎ PIÇÛK**

Birîna badê ye şûndevê kêçê ye
- Tiştên piçûk pir mezin dike.
**Birîna kêçê ye:**
- Bi heman wateyê.
**Ga dike çiya:**
- Bi heman wateyê.
**Gavan xeyidî nanê xwe berhev nekir, digot qey wê gundî hev qir bikin:**
- Dema mirovek bûyereke pir piçûk pir mezin bibîne ji bo wî tê gotin.
**Gavan xeyidî neçû ber garanê, digot qey wê dewar li bestê bimînin:**
- Bi heman wateyê.
**Hêl e hêl e hêl e, di dawiyê de du qijak û du reşêle:**
- Ewqas kir qelebalix, ewqas qiyamet rakir, di dawiyê de tişteke beredayî derket.
(Dema berf dikeve ji bo girtina kew, kêrvoşik û heywanên din gundî bi qelebalixî û bi hêlehêl derdikevin derveyî gund. Li hinek herêman ji vî karî re dibêjin hêl, li hinek herêman dibêjin karkew)
**Hinge serê derziyê:**
- Tişta herî piçûk.
**Kayê dike çiya:**
- Tiştên piçûk mezin dike; tiştên ne girîng girîng nîşan dide; pirsgirêkên piçûk mezin dike.
**Kerê xwe ser me dike qantir:**
- Bi heman wateyê.
**Kerê xwe ser me dike hesp:**
- Bi heman wateyê.
**Mêşê dike gamêş:**
- Bi heman wateyê.
Nîskê dike gîsk/nîska xwe dike gîsk.
- Bi heman wateyê.
**Pîrê ji tenûrê çû ber kulfikê, got Xwedê xirab bike ez çiqas erd geriyam:**
- Dema yek tiştekî piçûk pir mezin dike hingê tê gotin.
Qiyamet li serê me rabû/qiyamet li serê me rakir:
- Pirsgirêk piçûk bû lê pişt re mezin bû; pisgirêk piçûk bû lê wî mezin kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Li gundê Zixatê

## Bi terzê komînalbûnê xwebirêvebirina civakê pêş dikeve

Xwegihandina civakê ji bo xwebirêvebirina xwe gelekî girîng û pêwîst e, civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî derfeta vê yekê ji bû wan di şoreşê de hat avakirin ku di nava Rêveberiyeke Xweser de xwerêvebirina civakî pêş bixin an ku civak xwe bi awayekî komînal bi rê ve bibe.**R-3**



## 'Nenavendîbûn wê kirîza Sûriyê bi dawî bike û wekheviya gelan pêk bîne'

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Perwîn Yûsif anî ziman ku projeya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê garantiya mayîndebûna Sûriyke pirreng e û got, "Hikûmeta veguhêz ya Şamê hîna jî bi zihniyeteke navendî tê birêvebirin, ev jî dibe sedema têkbirina ewlehiya Sûriyê bi giştî."**R-7**




## Li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê jiyana jinan di bin xeteriyê de ye



Aktîvîsta TJA Hûlya Alokmen Uyanik tekez kir ku di salên dawî de li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê kuştina jinan her diçe zêde dibe û got, "Ev rewş nîşan dide ku mafê jiyanê û ewlehiya jinan li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê di bin xeteriyê de ye."**R-2**

## Kiryarên dijmirovî li Efrînê hîn berdewam dikin



Li Efrînê piştî hatina hikumeta veguhêz a Şamê jî hîn kiryarên dijmirovî berdewm dikin û gelek malbatên çeteyên ku li Efrînê bi cih bûne dernakevin û ger ku derdikevin jî pereyan ji xwediyê malan dixwazin, malê tev talan û wêran dikin û piştre derdikevin.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1302 27-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

## 'BI QASÎ YEKÎTIYA NETEWÎ, YEKÎTIYA HUNERMEND Û REWŞENBÎRAN JÎ GIRÎNG E'

Hunermend û têkoşera Kurd Bermal Çem da zanîn ku Îro pêvajoyek girîng a têkoşînê heye, pêwîst e hunermendên Kurd yekîtiya xwe ava bikin, li gorî pêvajoya aştiyê tevbigerin û wiha got: "Rêber Apo her tim pêşiya hunerê vekir û bawerî bi hêza hunerê anî, divê hunermend jî di vê qonaxa girîng de bi rol û misyona xwe rabin."**R-7**






## 'Yekgirtina pêkhate û eşîran rêya çareseriya kirîza Sûriyê ye'

Rêveberê TEV-DEM'ê li Amûdê Nasir Deqorî diyar kir ku ji bo derxistina şerekî navxweyî di navbera pêkhateyên herêmê de, dewlata Tirk û çeteyên wê bi her awayî planan didin meşandin.**R-5**



**Fahmnekirina ji dayikên aştiyê**
Farûk Sakik R-5



**Tirkiyê vebijêrka demokrasiyê ji holê radike....**
Zekî Bedran R-5



**Wateya jiyana azad**
Rohat Bulut R-6

# Li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê jiyana jinan di bin xeteriyê de ye

Aktîvîsta TJA Hûlya Alokmen Uyanik tekez kir ku di salên dawî de li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê kuştina jinan her diçe zêde dibe û got, "Ev rewş nîşan dide ku mafê jiyanê û ewlehiya jinan li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê di bin xeteriyê de ye."

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Kuştin û qetilkirina jinan ku di van salên dawî de li Bakurê Kurdistanê û Tirkiye û gelek deverên cîhanê zêde bûye, weke pirsgirêkeke civakî derdikeve holê. Ev kiryarên hovane ne tenê pirsgirêkeke takekesî ye, di heman demê de zîhniyeteke civakî û Polîtîke. Tundiyên li ser jinan û kuştina jinan li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê pirsgirêkeke berdewam e.

Li gorî çavkaniya JinNewsê ya meha Tîrmehê, li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê 28 jin û 3 zarok hatine kuştin. 25 jin jî bi rengekî bi guman jiyana xwe ji dest dane. Di raporê de hate destnîşankirin ku li bajarên mîna Stenbol, Amed û Mêrsînê êriş zêde bûne, tundiya li dijî jinan bi rengekî rêxistinkirî û sîstematîk didome. Girêdayê vê mijarê Aktîvîstê TJA Hûlya Alokmen Uyanik ji Rojnameya me re axivî.

**'Ji ber pergala mêrzayendî ku li ser jinê hatiye meşandin kuştina jinan zêde bûye'**

Aktîvîstê TJA Hûlya Alokmen Uyanik anî ziman ku li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kuştina jinan berdewam dike û wiha got: "ji ber pergala mêrzayendî ku li ser jinê hatiye meşandin kuştina jinan zêde bûye, ji ber ku jin li hemberî vê pergala mêrzayendiyê derket û têkoşiya, ji xwe re jiyanek bi rûmet xwest bû sedema ku li hemberî aloziyin wisa derkevin. Dema ku serî hildan û xwe birêxistin kir tundiya li ser zêdetir dibe, ji ber piraniya jinên ku tên kuştin jinên ku xwestin zewaca xwe biqedînin ji aliyê mêrên xwe têne kuştin ji ber wan dixwest ku jiyaneke din bijîn lê ew bi kuştinê rû bi rû dimînin.

**Zîhniyeta baviksalarî îdeolojiyeke ku mêr bi hêz dide nîşandan**

Hûlya:Zihniyeta baviksalarî îdeolojîyek e ku dibêje mêr ji jinan bihêztir e. Û wiha got" ew îdeolojî bikaranîna şîdetê ya mêr li ser jinan rawa dike, dihêle ku jin bê parastin bimîne. Li Bakurê Kurdistanê ev tundiya li hemberî jinê her ku diçe zêde dibe û tu kes nikare bisekinîne, tacîz û tecawûz di rêjeyek mezin de ye, dewlet bi xwe hişmendiya wan a mêrzayendiyê ye û ji bo parastina jinê jî tu tiştan nake. Hertim dewlet dibêje ku jin û mêr ne weke hevin hişmendiya wan wisa ye. Xwekuştina jinê jî zêde bûye ew jî bi sedema mêre, ji ber ew dixwaze ku ji wê jiyana ku hatiye zordarkirin xwe jê qut bike, lê pirî caran dema ku jin tê kuştin jî li ser destê malbata xwe yan jî mêr dibêjin ku wê xwe kuştiye."

**'Divê ku civak bi temamî hişmendiya mêrzayendiyê ji kokê ve bugherîne'**

Hûlya Alokmen Uyanik bal kişand li ser pêwîstkirina guhertina zihiniyeta mêrzayendiyê di nava civakê de û got: "Dewlet ji bo kujerên jinan cezayên giran nastînin, bi şeklekî têne berdan. Mêr dizane ku ew çiqasî tundiyê li hemberî jinê bike ew ji aliyê dewletê ve cezayên giran naxwe û wê dewlet xwedî li wan derkeve, ji ber ku mêr dizane ku dewlet zayendpereste. Ev mijiar bi giştî bi cezaya mêran nayê çareserkirin, lêbelê divê ku civak bi temamî hişmendiya mêrzayendiyê ji kokê ve bugherîne.

Divê hişmendiya tundiya li ser jinê di civakê de bê zêdekirin. Divê li ser vê mijarê xebatên perwerde û agahdarkirinê bên kirin û bê gotin ku şîdet tevgereke ku nayê qebûlkirin e. Li Amede bûyerek çêbû ku du jin di navbera 40 rojan de hatin qetilkirin û kujerê wan hevalên hev bûn ev jî diyar dike ku di nava civakê de çîneke hatiye avakirin ku êdî kuştina jinê mêr ji xwe re maf û heq dibîne û di nava civakê de belav bûye. Dema ku mêr dibîne ku jin dixwaze ku azad bijî û bixwazin ku jiyana xwe bugherînin mêr dîrek wan dikuje û gelek caran dibêjin ku jinê xwekuştiye."

**'Ji bo kêmkirina kuştina jinan divê dewlet tedbîrên bi bandortir bigire'**

Aktîvîstê TJA Hûlya Alokmen Uyanik axaftina xwe wiha qedand û got: "Çareserî ji bo ku kuştina jinan kêm bibe xwebirêxistinbûne, ku jin têbikoşe ji bo jiyaneke azad û li hemberî hişmendiya mêrzayendiyê derkeve û xwe biparêze ji vê hişmendiyê. Aliyê din jî weke tevgera jinê azad em dikarin di nav civakê de û di nav jinan de divê em birêxistina Komûnbûn di her hêlê jiyanê de em bi cih bînin, tenê rêxistina jin û guhertina zihniyeta jinan ne bese, lê divê nerîn



û zihniyeta mêran jî bê guhertin. Pêwîste paradîgmeya azadiya jinê û mijara wekheviya jin û mêr di nava civakê de bi gelemperî berfireh bibe, ev jî dem jê re pêwîst dike ji ber ev zihiniyet ji salên dûr û dirêje ji bo wê jî zehmetî hene ku ev hişmendî bê guhertin. Perwerde jî dihêle ku jin hişmendiya xwe zêde bike û mafên xwe biparêze. Jinên ku nikaribin bi têrkerî ji derfetên perwerdehiyê sûd werbigirin, dibe ku haya wan ji şîdeta ku rastî wan tê nebe an jî nizanibin li dijî vê şîdetê çawa têbikoşin. Û ji bo kêmkirina kuştina jinan divê dewlet tedbîrên bi bandortir bigire û qanûnên pêşîlêgirtinê derxe."

# 'Desthilatdar bi Şerê Taybet dixwazin hêza jin bişkînin'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Rojnamevan Emel Mihemed diyar kir ku zihniyeta desthilatar ji bo îradeya jinan bişkîne rêbazên Şerê Taybet dide meşandin û got, "Ji ber hêz û têkoşîna jinan li pêşiya zihniyeta desthilatar dibe asteng, Şerê Taybet li ser wê tê meşandin."**

Bi saya ramanê Rêber Apo, Şoreşa Rojava û Tevgerê Azadiyê, jinê azadî û helwesta xwe piştî bi hezarên salan ji tundî, destdirêjî û desthilatdariya ku li ser dihate meşandin, bi dest xist. Ev azadî ne tenê ji bo jinê Kurd bû, lê belê ji bo tevahî jinên cîhanê bû, bi taybet jinên Ereb ji ber ku di nava civaka Ereb de tundî û desthilatdarî li ser jinê zêde ye. Şoreşa Rojava bû şoreşa jinê û jin bixwe pêşengtiya şoreşê dike. Piştî ku jinê di nava Tevgera Azadiyê û Şoreşa 19'ê Tîrmehê de hebûn, xwebûn û mafên xwe nas kirin, serî li hemberî koletiyê rakirin. Êdî



zihniyeta desthilatdar bi rêbazên cuda êrişî jinê dike, ji wan rêbazan jî "Şerê taybet e" da ku îrade û têkoşîna jinan bi vê yekê bişkînin. Di derbarê êrişên ku bi rêya medyaya dîjîtal li dijî jinê tê kirin, rojnemevan Emel Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**'Ji bo mêr azadiya jinê pirsirêk e'**

Emel Mihemed diyar kir ku zihniyeta desthilatdar dixwaze bi rêya medyaya dîjîtal îradeya jinan têk bibe û wiha got: "Zilamên zayendperest azadiya jinê qebûl nakin. Azadiya jinê piştî 5 hezar sal ji tundî û koledariyê, ji bo mêr pirsirêk e. Herwiha ev zêdeyî 50'î salan Rêber Apo û Tevdera azadiyê ji bo "Azadiya Jinê" têdikoşin. Êdî jinê helwest, azadî û xwebûna xwe parast û diparêze. Di heman demê de jin bûn pêşeng ji şoreşê re û sembol ji hêz û têkoşînê re. Jina kurd ji bo tevahî jinên cîhanê bûn nîşaneya azadî û aştiyê. Hemû jin ji jina Kurd bandor bûn û wan jî daxwaza azadiyê kirin. Di nava hin malbatên civaka Ereb de nêrîn û azdiya jinê bi yek car nedihat qebûkirin, lê bi berxwedana jina Kurd re ev rewş hat guhertin, ji ber jina Kurd jinên Ereb jî dane guhertin û wan hêdî hêdî ber bi rêya azadiyê ve birin, mînaka wê jî ew e ku îro jina Ereb cihê xwe di nava gelek kar û xebatan de digre. Lê zilamên ku bi zihniyeta desthilatdarî, serwerî û kapîtalîzmê tev digerin, azadiya jinê qebûl neke. Lewma bi rêya şerê taybet û rêbazê medyaya dîjîtal êrişî jinan dikin, da ku jinan bixin bin tirsê de û ji wan xebatê dûr bixin. Lê jin tu carî rêya têkoşîn û berxwedaniyê bernade."

**'Dixwazin bi şerê taybet dengê jinê tune bikin û civak li dijî hev rabin'**

Emel Mihemed eşkere kir ku êrişên bi rêya şerê tayabet zêde bûne û wiha domand: "Li tevahî welatan û bi taybet li herêma me Bakur û Rojhilatê Sûriyê bandora şerê taybet zêde bûye, bitaybetî jî jin û ciwanan dikin armanc. Zihniyeta desthilatdar gelek rêbaz bikar anîn, da ku îradeya jinê têk bibe lê nikarîbû, lewma berê xwe daye rêbazên şerê taybet. Li kêlek vê yekê dewleta Tirk û çeteyên wê jî bi hemû rêbazan êriş dikin ji bo ku ne tenê îradeya jinê bikşîne, lê ya vî gelî jî. Herwiha dawaz ew e ku azadiya jinê sînordar bikin. Di demên dawî de jî êrişên medyay dîjîtal li dijî jinê zêde bûne, bi taybet li ser jinên Ereb. Piştî ewqas sal ji şoreşê hin jinên Ereb xwe ji koletiyê rizgar kirin û bûn xwedî deng, lewma ew dixwazin dengê jinê tune bikin, hem civakên li vir li dijî hev rabin û şerê navxweyî di nava gelan de ava bikin. Lê jin wê hertim ji bo derxistina dengê rastiyê têkoşîn û berxwedaniyê bike."

**'Di nava civakê de mijareke hesas û exlaqî tê destgirtin'**

Rojnemevan Emel Mihemed axaftina xwe wiha qedand: "Di vê demê de pêşketin di zanistê de çê bûye, lê ev pêşketin bi rêbazekî şaş û qirêj tê bikaranîn. Bi rêya medyay dijîtîl jinan dixapînin û ditirsînin. Di nava civakê de ev mijarek hesase û exlaqî ye. Bi vê yekê gelek jin rastî kuştinê di bin navê şerefê de tên. Ev rêbaz zêde di nava civaka Ereb de hatiye belavkirin û civala Ereb di van bûyeran de gelek şidetin, ji ber wê jin dibin qurbanê zihniyeta zilamê zayendperest û qirker."



# 'Bi qasî yekîtiya netewî, yekîtiya hunermend û rewşenbîran jî girîng e'

Hunermend û têkoşera Kurd Bermal Çem da zanîn ku divê hunermendên Kurd di nava tevger û yekîtiyekê de bin û li gor pêvajoyê nêz bibin û got "Rêber Apo her tim pêşiya hunerê vekir û bawerî bi hêza hunerê anî ku got "PKK'ê romaneke, PKK'ê helbesteke" di wê demê de ev misyonek bû û Rêbertî da pêşiya hunermendan".

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Girêdayî rastî û rewşa huner û hunermedên Kurdî di vê pêvajoyê de hunermend Bermal Çem bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Huner perçeyek ji hebûn, çand, têkoşîn û helwesta gela ye, bi gelemperî asta hunerê di cîhanê de hûn çawa dibînin û dinirxînin?**

Di Rojhilata Navîn û Kurdistanê de huner cuda diherike, her wiha di bin mêtîngeriyê û di Ewropa de cuda diherike. Lê dema em weke serdem digrin dest em di serdema teknîkê de jiyan dikin, bi taybet li ser kêm netewan serdemeke qirkirinê heye. Ji bo wê jî di astekê de bi rêya vê tekneolojiyê huner pir zû belav dibe û gerdûnî dibe. Hunermendek dikare pir zû berhemekê avabike, bigihîne welatekî din û ji derdor bandor bibe. Bê guman aliyê wê yê erênî jî heye û yê neyînî jî heye. Teknîka heyî bi endustryalîzmê di hunera heyî de helandinek ava kiriye. Berhemên ji pêwîstiyên civakê re bibe bersiv dernakeve, pir bi lez berhem derdikevin û bi lez winda dibin.

Em bêjin berê berhem û fîlmên ku dihatin çêkirin pir dirêj bûn û wext digirtin ku sebra însanan hebû û bi hunerê re xwehunandin hebû. Lê niha bi herikîna teknîkê re êdî însan nikare stranekî 2 deqe guhdar bike; ev tuketine û têr nabe. Gelek tişt li ser teknîkê tê bikaranîn û jiyana însan ji civakbûyînê û parvekirinê qut e. Helbet ev bandor li ser hunerê jî dike. Berê huner kolaktîv bû, dibe çalakî a kesekî be lê bi kolaktîv belav dibû. Her wiha di asta cîhanê de bi komî xebat dihat meşandin, dema berhemek dihat çêkirin gelek caran demdirêj li ser lêhurbûn dihat kirin, ango ew berhem çîrokên wê yên jiyanê durûdirêj hebûn. Di ciwanên niha de lêgerînek heye lê ew jiyankirin û watedayîn kêm e. Ji ber wê di asta cîhanê de dibe ku çand û nêzîkatiya her neteweke ji hunerê re cuda be, li hin cihan bi awayekî akademîk û profesiyonal jî tê dayîn lê di wate û xuliqkariyê de lawaziyek tê jiyankirin.

Di bingeh de ger teknîka heyî rast were bikaranîn, dikare pir zû civakê biguherîne û bi berhem û peyamên hunermendan di civakê de wate ava bike. Lê belê ev hinek bi erênî û neyînî di nav hev de diherike. Di serdema heyî de ketineke mezin heye, hestên ku niha însan jiyan dike û piştî saniyekê jiyan dike ne weke hev in. Ji ber serdema em tê de di warê bîrdoziya kapîtalîzmê de şerek piskeolojîk li ser gelan dimeşîne. Hîn zêdetir weke robotekî jiyan dike êş, ken, girî, hest û kêfxwaşî dikare hin caran wateya xwe winda bike.

Di sedsala 21'emîn de bi pêşketina endustryalîzmê, teknîk û kapîtalîzmê re, vîrosên ku dixwazin civakan, çanda demokartîk û komînalîzmê tune bikin hene. Ev hemû bi rêya teknîkê pêş dikevin ku her tiştî dighînin ber destê însan da ku lêgerîn û parvekirina mirov winda bikin; ev yek bandora xwe li hunerê jî dike.

Bi tayebt li Ewropayê kenê li ser rûyê mirovan êdî kêm bûye, ev yek jî ji ber kêmbûna hunerê ye, ji ber hunerê wate li jiyanê barkiriye û zindî kiriye. Dibe em aktîvîstên hunerî dibînin, bê guman gelek hunermendên ku karên bi wate dikin hene, lê bi giştî serdema heyî di van aliyan de kirîzan jiyan dike û civakek ber bi robotbûyînê ve diçe.

Bê guman gelek civak û gelên ku bi komînalî jiyan dikin û têkoşînê didin meşandin hene, yek ji wan jî gelê Kurd e. Lê bi taybet ji bo çandek demokratîk û hemû gel û netew bi zimanê xwe jiyan bikin Tevgera Azadiyê pêşengtiya wê kir û bi taybet jina kurd. Mirov dikare bêje şerê vê serdemê herî zêde ser çand û hunerê tê kirin, li hember wê çanda berxwedanê derdikeve û têkoşînek tê dayîn. Weke altirnatîf di aliyê hunermendan, nivîskar û yên ku dixwazin çandeke demokratîk avabikin, têkoşîn û berxwedanek heye.

**Bi taybet di serdema heyî de hûn hunera Kurdî li çar aliyên Kurdistanê çawa digirin dest. Her wiha li hember siyaset, pilan û şerê li ser gelê Kurd û Kurdistanê gelo hunermend û hunera Kurdî çiqas derketiye pêş û bûye bersiv?**

Gelê Kurd xwediyê çanda kevnar e ku hîn di dema neolotîkê de xwedî hebûnekê ne û heya roja îro çanda xwe parastine. Lê li ser ziman, çand û netewa me her tim siyaseteke qirkirinê hatiye meşandin. Ji bo wê huner û çanda Kurdî, hinek birîndar e, karkterekî xwe ya berxwedanê heye lê di heman demê de birêndar e jî. Di oxira xwedî derketina li hebûn, çand û zimanê xwe de her tim rastî kuştin, ceza û hesabxwestinê hatiye.

Dema em dibêjin çar perçeyên Kurdistanê, çanda me jî di nav çar perçeyan de hatiye perçekirin. Kurdan jî li kêlek asîmîlasyonê bi rêbazekî çanda xwe parastine. Ji ber Kurd xwedî çandeke dewlemendin, dîrok û çanda wan winda nebûye û dîrokekî pir zindî em jiyan dikin. Herî zêde di warê ziman de rastî asîmîlasyonê hatiye ku bi taybet li Bakurê Kurdistanê ev dihat ferizkirin. Ji bo tune bibin stranên me dihatin dizîn, navên gundên me guharandin, navên Kurdî qedexe kirin. Dibe ku zimanekî perwerdê nîn bû, herî zêde bi stran, çîrok, dengbêjî û lorîkên dayîkên xwe em dihatin perwerdekirin. Bi Tevgera Azadiyê re Kurd zêdetir şiyar bûn, rê û rêbazên têkoşînê nas kirin û di aliyê bîrdozî de çanda qedîm zindîtir kirin.

Mînak; li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê çanda Kurdî gelek zindî ye, Kurdan bi rêya sîname, çand û hunerê, zexta sîstemê qebûl nekirine. Li çar perçeyên Kurdistanê jî dewlemendiya jiyana Kurd heye bi dehan zareve û şêwazê jiyanê hene, tên jiyîn û tên parastin.

Hunera Kurdî niha ji asta qirkirinê derketiye, êdî divê em ji qonaxa parastinê derkevin, zengîntir û gerdûnî bikin. Ji ber gelek kesên ku ji Rojhilata Navîn ku ji Mezobotamiyayê ji nav civaka Kurd derketine hene, lê belê kes van nizane. Divê êdî em van derxînin holê û di aliyê perwedehiyê û akademîk de em çi bûn ji kur hatin û bandora me çi ye, em hîn zêdetir di van aliyan de perwerde û berhemên xwe amede bikin. Îro Rappê herî bi deng ji dengbêjiyê tê. Ji ber wê jî hunera Kurdî bandora xwe li ser hunera cîhanê kiriye û ji wan jî girtiye.

Têkoşîna me heya niha li ser esasê em xwe biparêz in û bêjin em Kurd hene, bû. Serokatî jî viya pir xweş tîne ser ziman dibêje êdî Kurdan hebûna xwe îsbat kiriye, divê em xwe gerdûnî bikin. Ji me tê xwestin em berhemên xwe yên bibandortir avabikin, hîn zêdetir hunermendên Kurd di nava tevger û yekîtiyekê de bin û bi hunermendên din re di nava yekîtî û têkiriyan de bin. Bi tayebt bi hunermendên iternasyonalîst re xebatên hevbeş bikin ku tê dîtin bandorek me li ser gelê Ewropî jî heye.

**Bi hemdemiya geşedanên ku di asta Kurdistanê û doza gelê Kurd de tên jiyankirin, girîngiya yekhelwesta hunermendên Kurdistanî di asta giştî de divê çawa be?**

Pirsekî girînge; me got di welatê me de perçebûyîn çê bûye, di nava huner û hunermendên me de jî perçebûyîn çê bûye. Ev pêvajo li çar perçeyên Kurdistanê hemû hunermendan eleqedar dike. Ji ber em dibêjin divê çanda demokrat bi pêşengtiya hunermendan de pêş bikeve û yekîtiyê ava bikin.

Piştî banga Rêber Apo a "Aştî û Civaka Demokratîk" bi rastî hinek xebatên hunerî hatine çêkirin. Rêber Apo silavên xwe ji hunermendan re jî şand û misyonak da pêşiya wan. Rêber Apo her tim pêşiya hunerê vekir û bawerî bi hêza hunerê anî ku got "PKK'ê romaneke, PKK'ê helbesteke" ev di wê demê de misyonek bû û Rêbertî da pêşiya hunermendan. Îro pêvajoyek girîng a têkoşînê heye. Hunermend dikarin bi berhemên xwe konserên bi komî çêbikin. Heyanî niha dibêjin em girêdayî filan rêxistin, tevger, perçeyê ne û hev du qebûl nakin. Di vê pêvajoya girîng de divê her kes destê xwe bide ser wîjdanê xwe û bêje êdî ez pêşengtiyê ji vê pêvajoyê re bikim. Divê Rêxistin û yekîtiya hunermendên Kurd bên avakirin, werin gel hev nîqaşan bikin, ji bo pêvajoyê perspektîv derxînin. Konferansan lidar bixin, hunermendên Kurd li Ewropayê berê xwe bidin Kurdistanê, bêjin em dixwazin serokê xwe bibînin. Biçin di nav bajar, gund û gel de bigerin moral bidin gel. Her çiqas kîmasî û rexne hebin, xebatek û kedek tê dayîn. Lê li gor pêvajoyê ne têrker e û her kes li bendemayînê ye.

Çawa ku Rêbertî dibêje yekîtiya netewî ji bo gelê Kurd li çar perçeyên Kurdistanê, di nav vê de yekîtiya hunermedn û rewşenbîran jî gelek girêng e. Em dikarin bang bikin her hunermendek di aliyê xwe de di nava tevger û hewildanê de be ku rola xwe biçûk nebîne.



**Di dawiyê de tu jinek hunermend, sazvan û têkoşer ji bû xwe tu hunerê çawa dibîne?**

Ev pirs ji bo min gelek zehmete. Ji ber min tu carî huner ji xwe re weke mesleke ango xebatek nedîtiye, wateya jiyana min e. Huner ji bo min nefesek e, li hember zor û zehmetiyên vê jiyanê min bi hunerê nefes girt. Êş û kêfxweşiyên min jiyan kirine, min hewil da bi huner û berhemên xwe teysandina wê li civakê bikim. Em di nava civakekî berxwedêr û têkoşer de mezin bûn, me gelek mirovên bedew jî nas kirin û kêlî bi kêlî me wate li jiyanê bar kir. Ger stran û awaz tune ba, belkî me nedikarî jiyan jî bikira. Ez ji bo xwe bêjim ger muzîk nîn bûya min nedikarî li hember evqas êş li ber xwe bida. Ji ber wê jî ez fêr bûm ku huner jî rêbazekî têkoşîn û berxwedanê ye. Her wiha rêbazeke ku em qêrîn, hest û kêfxweşiyên xwe bighînin çar aliyê cîhan.

Ji bo min huner şêwayê jiyanê ye. Min bandora huner û muzîkê dît ku çawa li hember zor û zehmetiyan ez rakirim. Bê guman ji bo nirxên vê jiyanê û çanda gelê Kurd re ez hîn nebûme bersiv, hîn jî ev têkoşîneke min e û xebat dimeşînim. Ji ber her hunermendek li pey wateya jiyana xwe ye, li pey noteyên azadiya xwe dibeze ev jî lêgerîneke bê dawî ye.

Têlên ku ez pêl dikim her yek behsa serdemekê û rastiyekê dike. Karekterê hunerê ne homojen e, komînal e, ji ber wê di xwezaya wê de wekhevî û parvekirin heye. Wateyê li jiyanê bar dike û hinek estetîze dike. Ji ber wê jî Aram Tîgramgot "Ez hemû çekan bikim stran û diyarî zarokan bikim" her wiha gelek kesên ku bûne pêşengên azadiyê bi awazekê, fîlmekê, pirtûkekê, helbestekê û hwd bandor bûne. Ev tiştên ji rêzê nîn in însan çiqas fîzîk e ewqas jî metefîzîke, lê yê ku dikare vê metefîzîkê bandor bike; huner e. Ji ber van bila çiya, gund, kolan û civaka me bi hunerê bixemilin. Bila hunermendên me bê sekin û hedan her biafrînin. Xeyala gelek hevalan ew bû ku bi hunerê civakê bedew bikin û di vê rêyê de jî xebat kirin û şehîd bûn.

# Kiryarên dijmirovî li Efrînê hîn berdewam dikin

Li Efrînê piştî hatina hikumeta veguhêz a Şamê jî hîn kiryarên dijmirovî berdewm dikin û gelek malbatên çeteyên ku li Efrînê bi cih bûne dernakevin û ger ku derdikevin jî pereyan ji xwediyê malan dixwazin, malê tev talan û wêran dikin û piştre derdikevin.

**Zana Roj/Qamişlo**

Di bin serweriya komên çete û dagirkeriya Tirkiyê de, li Efrînê, Serêkaniyê û Girê Sipî tu kiryarên dijmirovî û qirkirina nasnameya gel û ya herêmê nema û nekirin. Ev siyaset di encama siyaseta dagirkeriya Tirkiyê li ser Rojavayê Kurdistanê de hate kirin ku bi êriş û hedefgirtinên xwe dixwest herêmê dagir bike. Di encama van êriş û pilanên dagirkeriyê yên navdewletî ku em dikarin bi komploya hêzên navdeweletî li ser Rojava bi nav bikin de Efrîn 2018'an Serêkaniyê û Girê Sipî jî di 2019'an de hatin dagirkirin. Bi taybet rewşa Efrînê ji herêmên din cudatir bû, Efrîn bi nêzbûyîna xwe ji sînorên Tirkiyê û durbûna wê ji herêmên Rêveberiya Xweser re her wiha cihê xwe yê stratejîk di aliyê zengînbûna ser erd û bin erd de, siyaseteke taybet li Efrînê hate meşandin.



### Pêşxistina sîxurtiyê û çetetiyê di nava ciwanên Kurd li Efrînê

Di heyva Tebaxê de hat dîtin ku siyaseteke nû li ser herêma Efrîn û bi taybet li ser ciwanan tê meşandin. Komên çete di Efrînê de dixwazin ciwanên kurd di bin nave ewlehiya giştî tevlî nava tûra sîxurtî û çetetiyê bikin. Li gorî hin agahiyên ku ji hin çavkaniyan hatine bi dest xistin amedekarî hene ku navendên tevlîbûnê li navenda Efrîn û navçeya Cindirêsê werin vekirin. Ji bona vê yekê jî ji neha ve propagandeya wê dikin û dibêjin pêwîste ku ciwanên Kurd li Efrînê tevlî hêzên leşkerî bibin û parastina herêmên xwe bikin. Lê di rastiyê de em baş dizanin ku niyeta komêm çete di Efrînê de ew e ku ciwanên Efrînê bikşînin nava xwe û wan li gor hişmendiya xwe perwede bikin û di karê sîxurtiyê û çetetiyê de bi kar bînin û wan di dema pêş de hember hêzên QSD'ê bidin şer kirin û kurdan bi destê kurdan bidin kuştin.

### Girêdayî vê yekê Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê di lêkolîneke xwe de ev ragihand:

HTŞ'ê ciwanên Kurd yên li Qamişlo ji Îdlibê ber bi Efrînê ve rêdike, di bin navê hêzên "Parastina Herêmî" bi piştgiriya MÎT'ê dixwazin Tabûrên leşkerî ji kurdan ava bike. Tabûrên Kurd yê berî niha li Efrîn'ê bi alîkariya MÎT'ê di bin navê hêzên "Parastina Herêmî" de hatîn avakirin, MÎT dixwaze vê tabûrê mezin bike. Li gorî vê yekê û bi tevlîkirina ciwanên ji Qamişlo yên ku li Îdlib'ê tevlî refên HTŞ'ê bûne re dixwaze tabûrên nû ava bike.
Wek lêkolîn.org agahiyên ku me bi destxistî, komek ciwanên Kurd ji Qamişlo û yên girêdayî Mesut Betal, li Îdlibê tevlî refên HTŞ'ê dibin, ji wir jî tên rêkirina ji bona Efrînê. Plan dikin ku ev kom, ji bo tevlî hêzên "Parastina Herêmî" yê li Efrînê bibin firsendek ava bikin. Bi vê awayî di pêvajoyên pêş de wê bingeha tevlîbûna ciwanên li Efrînê ji bo vê pêkanîna vê planê bê amadekirin.

### Koordînasyona HTŞ û ENKS

Ev çalakî, bi rêvebirina MÎT'ê wê bibe perçeya planek berfirehtir ya bi koordînasyona HTŞ û ENKS'ê re tê birêvebirin, bi vê re girêdayî Mesud Betal ku wek kesê berpirs yê di nav HTŞ'ê de ye di destpêka pêvajoyê de cihê xwe digre. Ebu Ducane El-Kurdî (Şadi Mişo) û alîkarê wî Azad Mîr'î El-Şabu ku berê di komên wek DAIŞ û El-Hemzet de çalakbûn, alîkarîya Mesud Betal dikin. Berê Mesûd Betal di nav HTŞ'ê de mîna berpirsekî tevdigeriya û bi eslê wî Kurd e, bi Ebû Ducane El-Kurdî re li ser esasê fermanên MÎT'ê, ji bo li Efrînê tabûrek Kurd ava bikin dest bi amadekariyan kiribûn. Van çalakiyên xwe jî bi alîkariya MÎT'ê li ser armanca mezinkirina tabûrê û ciwanên Kurd ji bona pêkanîna vê yekê bikartanîn.

### Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriya bîlancoya kiryarên komên çeta ya 7 mehan wiha ragihandin:

Kuştin: 14 kes hatine kuştin.
Revandin û Girtin: 158 kes hatine girtin û çarenûsa hin ji wan jî heya niha ne diyar e di nav de jin û kesên temen mezin jî hene.
Êriş û lêdan: 24 kes rastî lêdan û îşkenceyê hatine.
Şewitandin, birîn û ji kokê rakirina daristanan: Di çarçoveya şewitandina daristanan de, operasyonên şewitandinê di çarçoveya wêrankirina jîngehê de, mîna salên berê, dest pê kirin. Çar deverên daristanan hatin şewitandin, û hin ji wan di demên berê de jî rastî birîna neqanûnî ya daran hatin ku rûberên mezin ên bi qasî bi dehan hektaran vedihewîne, ew jî ji bo birrîna darên agir û çêkirina komirê ji bo firotina li bazaran. Di vê derbarê de komên çeteyan li tevahî navçeyên Efrînê bi armanca bazirganiyê bi daran bi hezaran darên zeytûn, fêkî û daristanan qutkitin û ji kokê ve rakirin.
Dizî û talan ji destê bermahiyên komên ku Tirkiye piştgiriyê dide wan û niştecihên wan di bin navê nenas de berdewam dike. Ji ber nebûna edalet û hesabpirsînê, diz û sûcdar li ber çavên rayedarên dagirker ên Tirk û yên herêmî bi rengekî serbest digerin. Her wiha ji aliyê niştecihên ku ji Efrînê derdikevin û ber bi herêmên xwe ve diçin, malên Efrîniyên resen yên ku tê de diman, hemû tiştê wê didizin, talan dikin û peyre diçin. Ew bêyî ku werin desteserkirin û hesabpirsîn ji nuqteyên kontrolê yên Ewlekariya Giştî û fraksiyonan re derbas dibin.

# Mihemed Beko; Jiyana tijî têkoşîn

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Nivîskar û welatprêzê Kurd Mihemed Nûrî Beko 34 sal ji temenê xwe di nav xizmeta gelê xwe de derbas kiriye û tevî temenê wî yê mezin jî hîn ew bi riya pênûsa xwe hemû hestên xwe tîne ziman.**



### Kurtejiyana wî

Nivîskar û welatparêzê Kurd Mihemed Nûrî Beko di sala 1943'an de li gundê Kurzêlê yê navçeya Şêrawa ya Kantona Efrînê ji dayîk bûye û jiyana xwe li wir derbas kiriye. Lê piştî dagirkeriya Tirk Efrîn dagir kir, wekî tevahî gelê Efrîn ew tevlî malbata xwe koçberî Şehbayê bûn. Piştî ku çeteyan dewleta Tirk êrişî Şehba kirin, ew tevî malbata xwe neçar man ku careke din dev ji hertiştî berdin û berê xwe bidin cihên ewle. Niha jî ew li bajarê Dêrikê bicih dibe.
Mihemed Beko gelek kar û xebatên siyasî di jiyana xwe de daye meşandin û tevlî partiyên siyasî jî bûye. Ji ber van xebatan ew gelek caran rastî işkence û gitinê hatiye ji hêla hikumeta Baas ve, lê dîsa jî wî xebatên xwe berdewam dikirin. Di sala 1984'an de dema ku wî di Partiya Komînîst a Sofyetê de kar dikir têkoşera Kurd Sakîne Cansiz serlêdana mala cîranê wan kir, wî ew dît bi axaftin û rewşa wê bandor bû, wî çend pirs jê kirin li ser rewşa siyasî û rewşa cîhanê. Piştî wê êdî wî dev ji partiya Komînîst berda û di sala 1985'an de berê xwe da Partiya Karkerên Kurdistanê û dest bi kar û xebatên rêxistinê di nava civakê de kirt. Piştî 22 salan kar û xebat, bi avabûna Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê ew tevlî bû û 12 salan kar û xebat di wir de jî daye meşandin.
Piştî naskirina wî ji tevgera azadiyê re, wî dest bi karê nivîsê kir û bi dehat nivîs, gotar û helbest nivîsandin. Di heman demê de wî hin nivîs bi awayê şîretan nivîsandin, her wiha wî hin pitûkên dîrokî jî nivîsandine.

### Koçberî bû sedema windabûna berheman

Mixabin gelek nivîsên wî li ber çapê bûn û ji ber rewşa koçberiyê derfet nebû ku wan komî ser hev bike lewma her tişt li şûn xwe hişt û hat. Tenê berhemekî wî hatiye çapkirin bi zimanê Kurdî ye bi navê Evîna Welat û çapa wê ya erebî jî hebû lê li Şehba ma. Herwiha tevî temenê wî yê mezin û rewşa wî ya tenduristî a nebaş jî, heya roja îro wî dest ji pênûs û lênûsa xwe bernedaye û nivîsên xwe berdewam dike û hilbestan dinvîse.

## Xwenasîn



### Wateya jiyana azad

**Rohat Bulut**

Di kûrahiha wateya jiyanê de azadî û aştî heye. Lê ji bo mirovên ku negihêjin kûrahiya wateya wê gelekî zehmetî, reşbînî, bêhêvîtî û koledarî heye. Lewre dema em bala xwe didinê, hebûnek li ser jiyanê ava dibe û teşe digire. Her wiha jiyan bi xwe jî hebûneke ku li ser hebûneke din diafire. Dema mirov dikeve nav raz û felesefeya jiyanê, bi qasî ku kelecanê, tehm û xweşiyekê dide avakirin, di heman demê de tirs û xofekê jî dixe nav dil û bedena mirov. Dema ku em behsa jiyanê dikin dibe ku yekser jiyana mirovan were hişê mirov. Lê belê di bingeha xwe de jiyan, hebûna gerdûnekê bi xwe ye. Tişta ku dixwazim li ser rawestim ji jiyana mirovan û ya bi hev re ya ku civakê ava dike ye.
Di warê têkilî de mirov û di warê giştî de jî civak xwedî taybetiyên girîng ên gerdûnê bi xwe ye. Gerdûn bi xwe yek e û di heman demê de hebûneke ji pirî û avabûneke giştî ye. Ev ji bo mirov û civakê jî derbasdar e. Lewre mirov bi xwe jî proto-gerdûn e û ew mirovê proto-gerdûn ku tê cem hev û du civakekê ava dike. Di vir de pirsa, "gelo hebûna gerdûnên din jî pêkan e?" tê hişê mirov. Ya rast li gel xebatên lêkolînerên zanistan û şîroveyên feylesûfan dikarim bêjim ku mirov dikare bi ramanekî azad bifikire û bighêje encamekê kûrahiha wateya jiyanê û sînorê ramanê azad ku xwe bigihîne wateya jiyanê.
Jiyan bixwe ji pergeleke jiyanî ya giştî pêk tê. Ji jiyana kes bigire heta ya civakekê, ji jiyan hemû zindîwaran bigire heta ya xwezayê, ji ya xwezayaya cîhanî bigir e heta ya stêrk, gerestêrk û bi giştî ya gerdûnê di nav hevsengiyeke pergalî de pêş dikeve. Naxwazim bikevin nav hûrgiliyan, lê belê dema ku mirov li ser hûr dibe dibîne ku ev jiyan bê çiqasî bi wate ye û heqîqeteke bêhempa di nava xwe de veduxwîn e. Lê mixabin em nagihêjin wê heqîqetê.
Ji ber ku mirov ewqas ji rastiya xwe, ji hebûn û jiyana xwe bêhaydar in, bi hêsanî dikarin jiyanekê tune bikin an jî bêwate bijîn. Heke em li ser jiyana me ya civakî rawestin dê bi zelalî bê dîtin ku pergala jiyanê ji holê tê rakirin. Heke qergala jiyana bi hev re ya civakî ji holê rabe dê dawî li civak û nirxên mirovî were. Nebûna nirxên civakî, mirov û civak bêwate dibin. Em dibînin ku di xweza û gerdûnê de ji derveyî mirovan cureyekî din ê zindîwaran ku ji bo hevdu tune bikin tune ye. Her zindîwarên di xwezayê de bi têkiliyeke simiyotîk dijîn. Lê mixabin ji ber ramanêm bîrdozîk ê mirova û ew hestên têrnebûyî rê li ber tunekirina jiyanê tîne.
Di serdemeke wiha ya zanist û zanînê de em mirov li şûna ku jiyanek bi nirx, têr û tije bijîn, ji bo tunekirinê çi ji destên me tê em dikin. Qaşo ji bo berjewendiyên xwe em vê yekê dikin. Lê di bingeha xwe de em tunebûnekê pêş dixin û haya me jî ji me çênabe. Em ne dizanin bijîn û ne jî zanin bidin jiyîn. Bê guman ronakbîr, rewşenbîr, rêber û pêşengên zana rê û rêbaza jiyana rast a bi hev re nîşan didin. Lê mixabin kesayetên berjewendîparêz rêya jiyana azad û biwate digirin. Ya pêwîst divê em xwe binasin, hebûna xwe û sedema jiyana xwe bizanibin ku bi wate û aştiyane bijîn.



# Bi terzê komînalbûnê xwebirêvebirina civakê pêş dikeve

Xwegihandina civakê ji bo xwebirêvebirina xwe gelekî girîng û pêwîst e, civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî derfeta vê yekê ji bû wan di şoreşê de hat avakirin ku di nava Rêveberiyeke Xweser de xwerêvebirina civakî pêş bixin an ku civak xwe bi awayekî komînal bi rê ve bibe.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

### Girîngiya civakê ji bo mirov

Ji bo mirovan civakbûyîn nebe, nabe. Lewra tu mirov bi tena xwe nikare bijî, tenê bi malbata xwe jî dê demek şûnde tune bibe, sînordariya qebîle û eşîriyê jî dê gelekî kêm were. Lê bi civîna mirovan a ser hev, bi heman zimanî axivîn û ji bo jiyanê hilberîna hevpar, dan û stendinên hevpar, pêşxistin madî û manewî ya hevpar, pêşxistina parastina hevpar, siyaset û polîtîkaya hevpar dê rê li ber yekitî û domdariya jiyaneke bi rûmet vebike. Dema di civakê de yekitîyek hebe jî dê bi hêsanî bikaribe jiyaneke bi rûmet û temendirêj bijî. Dê bikaribe bi rêxistinbûyîna xwe, bi pêşxistina siyaset û polîtîkayên xwe, xwe ji hemû êrişên tunebûnê biparêz e.

### Tunebûna civakê tê wateya tunebûna mirovahiyê

Parastina civakekê bi parastina nirxên wê yên civakbûyînê pêkan e. Heke nirxên hevpar ên civakbûyînê ava dike neye parastin, dê civakbûyîn jî li holê nemîn e. Tunebûna civakê tê wateya tunebûna mirovahiyê. Ev ji bo her dem û serdema dîrokê derbasdar e. Mirovan bi civakbûyînê hebûna xwe domandiye û heta roja meya îro hatiye. Lewma jî divê bi mirov re hişmendiya parastina nirxên civakî zêde hebe. Heke ew hişmendî nebe dê civakbûyîn û mirovbûyîn jî li holê nemîn e.

### Mirov bi civakê xwe li ser piyan dihêle


Di nava şart û mercên zehmet de mirov bi civaka xwe dikarî xwe li ser piyan bihişta. Pîvanê civakbûyînê jî ger ku nebûya, wê tiştekî ku civak li gel hevdu bihişta wê nebûya. Ji ber ku civakbûyîn bi xwe pîvana têkîliya kesayet bi civakê re û ya civak bi kesayet re ye, ev yek jî li ser têgihiştina jiyaneke hevpar pêk tê. Ya ku ev pîvan bi mirov û civakê da qezenckirin jî çanda jin ya xwedawendîtiyê bû. Gelek bermahiyên ku di roja me ya îro de ketine dest, vê rastiyê îsbat dikin.

### Xwebirêvebirina civakê ji aliyê ferdên civakê bi xwe bû

Mirovan bi hêsanî civakbûyîn ava nekirine. Dem û dîrokeke dirêj, mirov wekî hemû zindîwarên din takakesî jiyane. Çi ji ber şert û mercên xwezayî û çi jî ji ber jîndarên din gelek zor û zehmetiyên mezin kêşane. Her kêliya jiyanê bi dîtin, bihîstin, hest û hîsan tecrube kirine. Li gorî tecrubeyan ji bo xwe qada jiyanê ava kirin e. Bêguman ev qonexeke dûr û dirêje ku bi xwe re rê li ber şoreşên mezin vekiriye. Herwihe girîng ew e ku her mirov xwedî hişmendiyek xwenasiyê be. Heke mirov serboriya civak û mirovahiyê nizanibe, bi tevahî fêhm neke û weteyê nedê, dê nirxandina mirov û civakê jî kêm be. Lewra serpêhatiyên salan ên civakan û qonaxên ku tê re derbas bûne, bi hêsanî nebûye.
Ji ber di destpêka derketina mirov li ser rûyê erdê civakbûyîn nebû, mirov bi awayê takekesî jiyan dikir, her dem jî koçber bû, jiyana bi istqrar di wê demê de nebû. Mirov demeke dirêj jiyana takekesî jiyan kir, heya gihişt qonaxa kilanan ku ew bingehê civaka komînal ava kir. Koma kilanan a destpêkê da diyarkirin ku mirov xwedî nirxên civakî ye û bi nebûna civakê ew ê kilan jî ji holê bê rakirin, ji ber dema mirov bi tena serê xwe be, nikare xwe li hemberî şert û mercên demê biparêze. Lê dema kilan hat avakirin rêgezên xwezêdekirin, xwetêrkirin û xweparastin derket pêş. Piştî wê jî bi demeke dirêj a naskirina mirov ji bû xwe û jiyankirina wê di gelek qonxan re, gihşt qonaxa istqrarbûnê. Dema mirov li cihekî bistqrar bû, êdî civakbûyîna rast derket holê, her dem jî ji bo civakbûyînê xwerêxistin û xwebirêvebirin pêwîst dike. Mirovên destpêkê bixwe rêveberiya xwe dikirin. Ev xwebirêvebirin heya dema avabûna desthilatdarî û dewletê dewam dikir. Piştî ku dewlet ava dibe dijberiya rêgezên gerdûnî derdikeve holê. Înkara heqîqetê derdikeve holê. Her tiştên ku li ser rêgezên gerdûnî hatine avakirin hemû tên berovajî kirin. Pirsgirêkên ku di nav civakê de derdikevin ji vê demê şûndetir pirsgirêkên ku bi destê mirovan e.

### Civaka Kurd civaka herî zêde rastî êrişan hatiye

Derketina dewletê asta civakbûyînê li cem mirovan kêm kir ku hêzên serdest ji dîrokê heta niha ji bo civakê lewaz bikin, civakbûyînê ji holê rakin, berxwedana civakê bişkînin û tune bikin bi her awayî dixebitin. Dixwazin mîrateya civakê ya çandî û dîrokî tune bikin û rê li ber tarîtiyê vebikin. Lewma jî bi



her awayî êriş dikin. Ev rêbaza herî zêde ku kesên serdest bi kar tîne. Civaka kurd, yek ji wan civakan e ku herî zêde dewlet û desthilatan êrişî wê kiriye û hîna jî rastî êrişên dijwar tê. Di heman demê de hemû civakên cîhanê bi rêya desthilatdarî û kapîtalîzma têk çûne. Ji ber dema em li Rojhilata Navîn tevahî dinêrin asta civakbûyînê lê kêm bûye, ew jî bi sedema desthilatdariya ku li ser wê bi salan tê kirin, ev jî bi xwe re kirîzên mezin derxistine holê.

### Bi şoreşê re girîngiya civakbûyînê bû bingeh

Lê gelê Kurd bi koka xwe ya civakî re girêdayî ne, ji bo wê her ew li pey nirxên xwe yên civakî ne. Niha em bînin li ser erdnîgariya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî ku ew erdnîgariyeke gelek pêkhateyên cuda di nava xwe de dihewîn e, bi gotineke din em dikarin bêjin ew ji gelek civakan pêk tê. Civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî di bin zilma desthilatdariyê de jiyane, ev yek heye kêliya Şoreşa 19'ê Tîrmehê dewam kiriye ku heya wê kêliyê jî rêngê civakbûyînê xwe zêde nedida pêş an jî dihat tunekirin. Lê bi şoreşê re girîngiya civakbûyînê bingeh hate girtin û civakê jinûve rêxistinbûyîna xwe kir. Di heman demê de bingehê ku civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li set tê meşandin ku di nava Rêveberiyeke Xweser de xwerêvebirina civakî pêş bixin an ku civak bixwe xwe birêve bibe bi awayekî komînal, ew jî bi rêya avakirina komînan e. Komîn biçûktirîn şaneyeke civakî û birêxistinkirî ye, li ser bingeha sîstema civaka ekolojîk (civaka xwezayî) bipêşxistina jiyana xwe ya civakbûyînê armanc digire.

### Xwebirêvebirina civakê çareseriya yekser a pirsgirêkan e

Êdî gava destpêkê ya xwebirêvebirina civakê ji komînê ve hat destpêkirin û bi avakirina hemû saziyan di hemû qadan de, pêşxistina vê yekê hat kirin. Civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyên bi perwerdekirinê heta astekê xwebirêvebirina xwe dikin, lê di heman demê de şert mercên derdorê ew di vê yekê de kêm hiştine. Ji ber her dem şerê taybet û êrişên dagirkeriyê li ser wan nehatiye rawestandin. Lê asta xwegihandina civakê ji bo xwebirêvebirinê gelekî girîng û pêwîst e, ji ber dema xwebirêvebirina civakê ji aliyê civakê bi xwe be, ew dikare hemû pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bikin, ji ber her dem dewlet an jî desthilatdar ji bo civakê nake û ne jî xwedî li civakê derdikeve. Lê niha ew derfetên civakî hene ku xwebirêvebirina xwe ji asta ku gihayê mezintir bike. Komînalbûna civakê bi awayê jiyana xwezayî wê vê yekê misoger bike. Lewma hîn zêdetir pêwîst dike civak bi erk û misyonên xwe rabe.

### Li ser bingeha komînalbûnê civak xwe birêve dibe

Ruhê civakbûyînê ew e ku civakek têkliyên wê xurt bin û mirov ji hemû reng, bawerî û netwe bikaribin bi hev re rêvebirina xwe bikin û li ser bingehê komînalbûnê awayê xwerêvebirinê pêk were. Nemaze li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sîstema Netweya Demkratîk tê meşandin, hemû sazî, partî, dezgeh, rêxistin û hwd... ne yekreng û ne yek ziman e, ango pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ew bixwe xwe bi rê ve dibin, ji komînan heya Rêveberiya Xweser. Li ser hîmê rêveberiya hevbeş hemû pêkhate weke Kurd, Ereb, Suryan û hwd... xwe diparêzin, bi zimanê xwe dixwînin û xwe ji hemû aliyan ve bi rê ve dibin. Di serdema heyî de gelek dewlet bi nave demokrasiyê bang dikin, lê cewherên wan dûrî demokrasiyê ye. Dijminê sîstema Netweya Demokratîk di serî de dewletên navendî mîna Tirkiyê, hikumeta Şamê û hwd... in. Herwiha ji destpêka Şoreşa Rojava û avabûna Rêveberiya Xweser ve rêjîma Baas, Tirkiyê û gelek dewletên din ên herêmî xwestin vê projê têk bibin, lê di serî de rêjîma Baas li hemberî yekîtiya gelan têk çû. Di roja îro de jî hikumeta veguhêz a Şamê bi pêşengtiya dewleta Tirk dixwazin yekbûna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê lawaz bikin, tevliheviyê çêbikin û sîstma Rêveberiya Xweser hilweşînin. Lê dîsa gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê destkeftiyên xwe diparêzin û li ser pêkanîna projeya xwe li tevahiya Sûriyê bi israr in.

# ‘Nenavendîbûn wê kirîza Sûriyê bi dawî bike û wekheviya gelan pêk bîne’

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Perwîn Yûsif anî ziman ku projeya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê garantiya mayîndebûna Sûriyke pirreng e û got, “Hikûmeta veguhêz ya Şamê hîna jî bi zihniyeteke navendî tê birêvebirin, ev jî dibe sedema têkbirina ewlehiya Sûriyê bi giştî.”

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Piştî ketina rejîmê û desteserkirina Heyat Tehrîr El-Şam (HTŞ) ya di 8`ê Berfanbara 2024`an, rewşa Sûriyê bi giştî hat guhertin. Têkildarî mijarê Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Perwîn Yûsif diyar kir ku ji dîroka ketina rejîma Baas de, Sûriyê di xaçerêya dîrokî radiweste. Perwî Yûsif di hevpeyvîneke taybet de bersivên pirsên rojnameya me da. Hevpeyvîn wiha ye:

**Piştî ketina rejîma Baas û destederkirina Heyat Tehrîr El-Şam (HTŞ) ji desthilatdariya Sûriyê re, hûn rewşa Sûriyê bi giştî çawa dinirxînin?**

Bê gûman piştî şerê navxweyî yê Sûriyê ku zêdetirî 14`e salan dewam kir, danasîna rewşa siyasî li Sûriyê îro dihêle ku mirov têkeve wê baweriyê ku welat li ser xaçerêya dîrokî derbas dibe. Piştî ketina rejîma Baas û bi guhartinên ku ji dawiya sala 2024’an pêk hat herwiha bi hatina desthilateke nû ya demkî, îsbat kir ku pirojeya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, çareserkirina pirsgirêkên heyî ye. Mirov dikare vê bêje, rêveberî bûye hêviyên avakirina Sûriyeke demokratîk. Bê gûman ev yek jî încex bi nenavendîbûnê pêk were. Lê hikûmeta veguhêz hê jî bi zihniyeteke pir navendî tê birêvebirin û nenavendîbûna demokratîk li ser yekîtiya Sûriyê weke xeteriyekê dibîne. Lê berovaje, lewra ya rast ew e ku wê nenavendîbûn garantiya mayîndebûna Sûriyê ye. Lewra tevî hemû zextan aramî, xizmetguzarî û ewlehiya herêmê peyda kiriye. Lê ji bo têkbirina binesaziya herêmê, ji aliyê dewleta cîran ku desteserkirina vê hikûmeta demkî hêsan dike, di vir de diyar dibe ku ji bo aramiya neteweyî, pêwîstî bi peymaneke civakî ya nû ku mafê hemû pêkhateyên Sûrî cihê xwe tê de bigirin were nivîsîn.

**Hikûmeta veguhêz a Şamê bi çi rengî li dosya nenavendîbûna Sûriyê dinêre?**

Di danûstandina hikûmetê ya dosyaya nenavendîbûnê de, hê jî dosya sînordar dimîne. Di bin sernavên ‘Reforma rêveberî’ yan jî ‘Entegrasyona saziyî’ de projeyan pêşniyar dike. Lê di bingeha xwe de ew ji dervî diyaloga sînorkirî dernakeve dibe ku di kîjan kêliyê de, ji aliyê navendê ve were vekişandin. Li hember vê yekê, ji projeya me ya Rêveberiya Xweser daxwaza nenavendîbûna destûrî ya zelal dike ku ji rêveberiyên herêmî re zagonsazî û rêveberî dayîne. Herwiha di nava artêşeke neteweyî de rêveberiya çavkaniyê digire nava xwe û hêzên ewlekariyê yên herêmî tenê hevkariya parastinê be. Tişta ku îro tê pêşniyarkirin tenê weke şikliye. Lewra heta niha hêviyên herî kêm ên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk nayne û ne jî gelên herêmên başûr an jî rojavayê Sûriyeyê di nav de parêzgeha Siweyda ye ku di heman demê de li şûna sozên vala, dest bi daxwaza formekê hevkarî rasteqîn kiriye.

**Ji bo çareserkirina pirsgirîkên heyî hewldanên hikumeta veguhêz rastîn hene yan jî tenê soz in?**

Çareserkirina pirsgirêka reforma siyasî, ne bi pirbûna lidarxistina konferans û civînan ne. Lewra ya girîng hebûna rêvebirê siyasî yê ku ji bo çareserkirin û pêkanînê bibe bersiv. Ji bo wê em vê dibêjin bê nivîsandina destûreke nû ku nenavendîbûnê pêk bîne, ziman û çandan nas bike, jin û ciwanan di pêvajoya siyasî de xwedî roleke girîng bin, herwiha mafdayîna hemû pêkhateyan ta ku cudahiya olî di nav gel de were rakirin ji bilî vê yekê wê ti çareserkirin nîn bin. Çimkî çareserkirin bi pirbûna name û sozan nayê pîvan, lê belê bi parastina ser gepa nanê jiyanê rê li ber hilweşîna nan, genim, av û elektrîkê tê pîvandin. Îro encamê êriş û krîza li ser binsaziyê ya ku bi sala ye dûm kir, girantir dibe.

**Di nerîna we de sedemên sereke yên xwepêşandanên li Siweydayê yên li dijî hikûmeta Şamê çi ne?**

Xwepêşandanên li Siweydayê redkirina li dijî hilweşandina têkbirina jiyanan û mafxwarinê bû.
Ji bo jiyaneke demokratîk dirûşmên rûmet û azadiyê bilindkirin qirkirina nasnameya Durziyan û têkbirina dosya ewlekariyê red kirin. Ya herî girîng jî ev tevger parçebûna desthilata navendî radixe ber çavan û teqez kir ku pêwîstiya her pêkhateyek herêmî bi şêwazekî Rêveberiya Xweser heye ku mafên wan misoger dike nîşan da. Bi taybetî dema ku Siweyda di hefteyên dawî de ji aliyê hin eşîrên Bedewî rastî êrişên çekdarî hatin. Ev yek li ber çavên hêzên hikûmetê yên ku ji bo parastina sivîlan tevnedigerin pêk hat lê hikûmetê ji bo parastina gel tiştek pêşkêşnekir ev jî bû sedema kûrkirina kirîzê. Ev yek hişt ku hestê civaka Durzî xurtir bibe ku hikumet yan nikare wan biparêze yan jî ew bi xwe êrişên van çekdaran hêsan dike. Di encamê de êdî xwepêşandan nema tenê ji bo krîza debara jiyanê ye, êdî bû qêrîna dijî siyaseta heyî ku zext li civakeke tê kirin tenê ji bo ku daxwaza mafên xwe dike.

**Ji bo pêkanîna daxwazên xwepêşandanan, hikûmet çawa tevdigere? Qirkirina, îhmalkirin an diyalog?**

Ji aliyê xwe ve hikûmet daxwazên gel paşguh kir û di riya ewlehiyê de zextên ne zindî pêk anî. Ji bo pêkanîna aramiyê bi kesayetiyên herêmî re hinekî hewldan kir lê bi sozên xwe ne girêdayî bû. Ji bo diyaloga çareserkirinê hikûmetê ji aliyê xwe vet ê rê neda. Herwiha ev rêbaz li herêmên din jî pêk tine. Ev tê wateya ku nerînên pêkhateyan paşguh dike. Mirov dikare li vir tekez bike ku, bêdengiya li ser mafxwarina nasnameya gel ne çareseriye, berovajî wê, çareserkirina kirîza Siweydayê niha xwecihgirtina nûnerê wê di qada siyasî û mafdayîna wê di nava destûreke nû de hebe.

**Rewşa Siweydayê bandoreke çawa li herêmên din yên Sûrî kir?**

Serhildana Siweydayê li hemû parêzgehan belav bûn, bêdengî şikand û pirsa nenavendîbûnê weke hewcedariyê derxiste holê. Lewra wekî çareseriya neteweyî ne parçeyî ye tê hilbijartin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev yek bi lidar-



xistina konferans û diyalogan ji bo yekkirina helwestên pêkhateyan diyar bû ku gelê Sûriyê gihîştine wê baweriyê ku ji bo paşerojeke demokratîk, wê bi jiyana hevbeş were avakirin. Li parêzgehên din jî hişmendiya gel zêde bûye ku, hikûmeta navendî êdî nikare daxwazên civakê pêk bîne. Lewra ji bilî dayînapeymaneke civak nû ku nenavendbûn cihê xwe tê de bigire, wê ti çareserî pêk neyê. Bi perspektîfa Rêveberiya Xweser û Partiya Yekîtiya Demokratîk de aloziya Sûriyê ne qeyrana herêmeke taybet an pêkhateyeke tekane ye, ew qeyraneke sîstemeke temam e ku nikaribû pêşketinê îsbat bike. Di heman demê de tecrubeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû mînak û hêviyeke ji bo avakirina Sûriyeke federal a demokratîke. Tevgera Siweydayê mîna berxwedana Cizîrê ya li dijî dagîrkeriya Tirk û mîna israra Reqa û Dêra Zorê ya li dijî DAIŞ’ê hemû xal in ku piştrast dikin ku Sûriyeyî daxwaza dewleteke wekhev dikin. Ev jî wê bê nenavendîbûnê were avakirin ji bilî vê yekê wê ticarî aramî pêk neyê. Lewra ya herî girîng û pêwîst hevkariyeke rasteqîn ya di navbera hemû pêkhateyan de were avakirin û artêş û dewlet bi rengekî ku gel biparêze li şûna ku wan qir bike ji nû ve were avakirin.

# Alternatîfê Eseed nebû an jî nedixwestin hebe

**Kurdyar Dirê`î**

Di dirêjahiya 14 salan ji kirîza Sûriyê, mûxalefeta li himber rêjîma Eseed nebû bersiv ji daxwazên gelên Sûriyê re, yên di çarçova azadî, wekhevî û demokrasiyê de bûn , lê tersî wê bû bersiv ji ecendeyên Tirkiyê û Qeter re û hin jî bûn bingeh ji himbêzkirina rêxistinên mîna Elqaîde û DAIŞ’ê re, ku di encamê de him rêjîma Eseed di nava xwe de riziya û him jî mûxalefet di nava xwe de bê wate ma, mijarên demokrasiyê, wekheviyê û biratiya gelên Sûriyê di rojeva wan de nema, li şûna wê tewanbarkirina hevdû, gawirkirina pêkhateyan, guhertina armancan ji helwişîna Elesed ber bi ji holêrakirina gelê kurd û ferzkirina sîstemeke îslamî radîkal li ser Sûriyê û belavkirina zuhniyeta Îxwanelmuslimîn û cîhaddistan cih girtiye, ev rewşaya ketiye xizmeta jihevxistin, wêrankirin û nebawerkirina pêkhateyên Sûriyê ji hevdû re, ku ketiye xizmeta dewletên herêmî û hin hêzên navdewletî de, û temenê kirîza Sûriyê dirêj kiriye.
Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de alternetîveke demokratîk, pir reng, wekhevî, angu xweseriya demokratîk bi zuhniyeteke demokratîk û li ser bingehê biratiya gelan hatiye avakirin, lê belê herdem rastî êrîşên mûxalefetê di bin buhaneya cudekariyê, Tirkiyê di bin buhana terorê de û hin hêzên navdewletî bi buhaneya berçavgirtina metirsiyên Turkiyê û berjewendiyên xwe de hatiye, ango weke alternetîv nedane pêş, ev tiştaya bi sîstematîk hatiye kirin ku nedixwestin Sûriyê têkeve li ser rêya çareseriyê û aramiyê de. Di 8’ê Berfanbara 2024 de rêjîma Eseed hilweşiya. Piştî hilweşîna rêjîma Beşar Elesed û dawîhatina li sîstema Bass ya zêdeyî 60 salî berdewam kir, rengê Sûriya nû, mijara demokrasiyê, nenavendîbûn û dawîanîna li şer û pevçûnan ketiyê rojevê de, lê belê yên anîne li ser serdestiya Sûriyê tu nirx û pîvanên wan rojevan di xwe de nahewîne û di eynî demê de beşeke ji Al-Qaîde ne û di lîsteya terorê de ne! Cihê matmayînê jî ew e ku ji wan dixwazin ku demokratbin û hemî pêkhate, ol û mezheban himbêz bikin! Sûriyeke nû ava bikin! Gelo zuhniyeteke cîhadist, çawa demokrasiyê û pirrengiyê bipejirîne! Em dikarin bêjin ku bi sîstematîk alternetîvekeî cîhadist li şûna Eseed bicî kirin, ku bikeve xizmeta pirojeya jihevxistina deverê de, sîstemeke mîna Bakur û Rojhilatî Sûriyê ku li Şamê bi cî bibe, bê guman dê nekeve xizmeta parvekirina Sûriyê de. Serokê HTŞ’ê an jî Heyet Tehrîr Al-Şam Alcolanî, ji nava Al-Qaîdê de derketiye, bi DAIŞ’ê re tevgeriyaye, xwe ji DAIŞ’ê cuda kiriye û Cebhet AL-Nusra avakiriye û herî dawî jî tevgera xwe bi navê HTŞ bi nav kiriye, di nava lihevkirineke herêmî û navdewletî de derbasî Şamê bûye û xwe weke serweriya demekî binav kiriye. Li şûna ku hêzên demokratîk alternetîvê Eseed bin , endezyarên nexşekirina Rojhilata Navîn ya nû Elcolanî kirine elternetîv, ku plana perçekirin û jinûve dîzayînkirina Rojhilata Navîn û Sûriyê cîbicî bikin.



# ‘Yekgirtina pêkhate û eşîran rêya çareseriya kirîza Sûriyê ye’

Rêveberê TEV-DEM'ê li Amûdê Nasir Deqorî diyar kir ku ji bo derxistina şerekî navxweyî di navbera pêkhateyên herêmê de, dewlata Tirk û çeteyên wê bi her awayî planan didin meşandin.

**Aryan Hesen/Qamişlo**

Dewleta Tirk û çeteyên wê bi her awayî êrîş dikin, ji bo ku aramî û biratiya di nava gel, pêkhate û eşîran li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xerab bikin, ji ber vê yekê jî şerê taybet, derûnî û çekdarî dimeşînin. Dewleta Tirk û çeteyên wê, hertim hewil didin ku eşîrên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî Rêveberiya Xweser û QSD’ê rabikin. Armanca wan derxistina pirsgirêkan li van herêman e.
Di vê çarçoveyê de rêveberê TEV-DEM’ê li Amûdê Nasir Deqorî ji Rojnameya me re axivî.

**‘Xerabkirina biratiyê bi rêya şerê taybet û derûnî’**

Nasir destnîşan kir ku dewleta Tirk û çeteyên wê dixwazin bi rêya şerê taybet belavbûnê di nava civakê de çêbikin û wiha pê de çû: “Bi rêya şerê taybet û derûnî dewleta Tirk û çeteyên wê, dixwazin parçebûnê di nava pêkhate û eşîrên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de çêbikin. Armanca dewleta Tirk û çeteyên wê xerabkirina aramî û biratiya gelan e. Helwesta dewleta Tirk a dagirker reşkirina Rêveberiya Xweser û QSD’ê di nava pêkhate û eşîran de ye. Çeteyên dewleta Tirk bi rêya medya dijîtal dixwazin parçebûnê di nava gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de çêbikin, ji bo ku tevilhevî û pirsgirêkan di nava herêman de derbixin ji bo lîstokên xwe yên qirêj di nava civakê de bimeşînin.”




**‘Hevgirtina gelên Sûriyê çareseriye’**

Deqorî da zanîn ku yekbûna pêkhateyan û eşîran çareseriya kirîza Sûriyê ye û wiha domand: “Li hemberî parçekirina Sûriyê, hevgirtina gel, pêkhate, eşîre û qebîleyan pêwîst e. Yekbûna gelên Sûriyê rêya çareseriya tevahî pirsgirêkan e. Kombûna tevahî pêkhateyan û eşîrên Sûriyê lidarxistina civîn û raghandina helwestan û diyarkirina yakbûnê, çareserî ye. Herwiha di 8’ Tebaxê de li bajarê Hesekê konferansa yekhelwesta pêkhateyên Sûriyê hat lidarxistin, ev konferans gavek baş bû, tevahî pêkhateyên Sûriyê û rûsipên eşîran amadebûn û helwesta xwe ya yekbûna Sûriyê nîşan dan. Sûriyê bi parçebûn, rijandian xwînê û navenîbûnê çareser nabe, yakgirtina gelan, yakhelwest û nenavendibûn çareseriye.”



**‘Berjewendiya Sûriyê parastina pêkhateyan ne’**

Rêveberê TEV-DEM’ê li Amûdê Nasir Deqorî axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji bo pêşerojeke baş ji Sûriyê re, divê kar, xebat û danûstendin ji bo rewşa Sûriyê were kirin, da ku parastin mafê hemû pêkhate û êşîran were kirin. Ji berjewendiya Sûriyê ye ku parstina pêkhateyan û eşîran bike ye. Herwih girînge ku her demekê konfernas li ser asta Sûriyê bê lidarxistin ku tevahî gel, pêkhate û eşîrên Sûriyê cihê xwe tê de bigirin. Ya herî girîng ku Rêveberiya Xweser cihê xwe di serkêşiyê de bigire. Herwiha rewşa xizmetguzarî û aborî bêne çareserkirin û derfetek jiyanê ji gelên Sûriyê re were peydakirin.”

## Tirkiyê vebijêrka demokrasiyê ji holê radike....



**Zekî Bedran**

Hikumeta Şamê ji hevdîtinên li Parîsê vekişiya. Diyar e ku ev ji aliyê Tirkiyê ve hatiye xwestin û Şam li gorî wê tevdigere. DYA û Fransa hêzên ku vê yekê herî baş dizanin. Tirkiyeyê nexwest ku hêzek ku Kurdan jî di nav de ye bibe mijara hevdîtinên navneteweyî. Desthiladariya Tirkiyê hemû çavkaniyên xwe bi HTŞ’ê ve girêdayi ye. Lê, ew bi tevahî li dijî Kurdan cih girtiye û ev helwesta xwe neguhertiye. HTŞ’ê jî xwedî hişmendiyekê demokratîk nîne. Ew li dijî pirrengiyê ye û xwedî nêzîkatiyek tundrew û navendî ya hişk a rêveberiyê ye. Ji ber vê yekê, ew ne di rewşekê de ye ku planên dewleta Tirkiyê red bike an jî ji bandora wê xilas bibe. Girîng e ku mirov fêm bike ka li Sûriyê çi diqewime. Li ser rûyê erdê, hikumeta Şamê li dijî QSD û Rêveberiya Xweser rûniştin û danûstandinan dike. Lê di rastiyê de, ew dewleta Tirkiyê bi xwe ye ku li hemberî QSD û Rêveberiya Xweser danûstandin dike û ji wan radestiyê ferz dike. Hikumeta demkî ya Şamê dezgehek bindest e, karmendek rêveberiya Tirkiyê ye. Hikumeta Şamê niha hilbijartinên parlemanî xistiye rojevê. Wan ragihand ku ji ber nebûna ewlehiyê li Suweyda û Bakur û Rojhilatê Sûriyê hilbijartin nayên lidarxistin. Lê, berovajî gotinan herêma herî ewle Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Li vir lîstikek heye ku rastiyan xirab dike û binesaziyan ji bo êrîşan amade bike. Wan îdia kir ku ji bo ewlehiyê hêz dişînin Suweyda û komkuji anîn rojevê. Niha ew herêmên xweser wekî ne ewle nîşan didin. Rastî ev e, wekî ku wan heta niha kiriye, ew kesên ku radestî wan nabin, yên ku xwe rêxistin kirine û vîna xwe bi dest xistine, ji holê radikin. Ew naxwazin wan di rêveberiya Sûriyê de, bi cih bigirin. HTŞ bi Rêveberiya Xweser re peywendiyên heyi diparêze, lê qet wan nûnerekê Rêveberiya Xweser negirtine di nav hikumetê de û li ser mijara herêmên xweser nîqaş nekirine. Hilbijartin nayê wateya ku li gor dilê xwe vesazîkirina her kesê ku ew dixwazin e! HTŞ wisa dike. Herî dawiyê, Ehmed Şara dê ji 210 nûneran 70 kesan vesazî bike. Çawa hilbijartinek vesazîbûyina parlamenteran bike gengaz e? Ji ber ku Rêveberiya Xweser wan kiryaran na pejirîne, wana ji derveyî hilbijartinan digir in.
Gelê Sûriyê bêrêxistin e. Ew zehmetiyan dikşîn in. Birçîbûn, xizanî û bêkarî debara gel ya rojane astengiyan dide jiyan kirin. Li ser vê yekê komkujî û tirsa ku li ser Elewî û Durziyan hatiye ferzkirin zêde kirin, û çi daxwaz û vîn dê bimîne? Hemû dezgehên ragihandinê yên ku ji rejima Baas’ê girtine niha di bin fermana HTŞ’ê de ne. Ne gengaz e ku dengek an ramanek cuda li wir were gotin an weşandin. Şerekê taybet li dijberî û kampanyaya reşkirinê li dijî herêmên xweser, Elewî û Durzîyan tê meşandin. Propagandaya li dijî wan tê destpêkirin, îdîa dikin ku ew xayîn, cudaxwaz, sîxurên Amerîkî-Îsraîlê ne, û hwd. Ferasetekê bîrdozî li ser bingeha ol û nijadperestiya Ereb tê meşandin. Beşên civakê li dijî hev têne sorkirin. Divê hilbijartin jî wekî rêyekê ji bo guhertina rojevê û lêgerîna rewatiyê ji bo HTŞ’ê werin dîtin. Ne partî û ne jî zagonê hilbijartinê hene. Partî û hêzên rêxistinkirî beşdarî hilbijartinan nabin. Desteya hilbijartinê ku ji hêla HTŞ’ê ve hatî destnîşankirin dê hin kesan li herêman destnîşan bike û wan wekî hilbijartî ragihîn e. Di bingeh de, hilbijartin tine; vesazîkirin hene. Bi awayekî asayi, divê NYû hêzên Rojavayî vê yekê nepejirîn in. NY berê biryara xala 2254’an derbarê Sûriyê de derxistibû. Li gorî vê, divê hilbijartin li gorî rêziknameyan werin lidarxistin û bibeşdariya hemû aliyên peywendîdar were misogerkirin. Niha, ew wekî ku biryarek wisa tine be tevdigerin. Di demekê de ku Rojava û NY bêdeng dimînin, Tirkiye HTŞ’ê li gorî daxwaza xwe rêve dibe. Hikumeta Tirkiyê bê şert û merc piştgirî dide HTŞ’ê. Ew pergalek yekparêz û navendî dixwaze û ferz dike. Tirkiye ne tenê li deverên dagirkirî cih digire, lê di heman demê de destwerdanê di karûbarên wan ên navxweyî jî dike. Ew pêşeroja Sûriyeyê jî desteser dike. Rejîmek zordar mîna Baas’ê hatiye hilweşandin û hawîrdorek ji bo demokrasiyê hatiye afirandin. Bi awayekî aramî, divê gel bi coş be, meydanan tijî bike û azadiyê ragihîne. Divê hemû hêzên ku demokrasiyê dixwazin di hawîrdorek vekirî û azad de bikevin qada siyasî. Lê tiştê ku li Sûriyê diqewime berevajî vê ye.
Hikumeta Tirkiyê hewl dide ku bi destê HTŞ pergalek paşverû, ji Baasê zordartir û tund ava bike. Ew gefan li pêşeroj û demokrasiya Sûriyê dixwe. Her wiha bi qirkirin û komkujiyan hewl dide ku Rêveberiyên Xweser ên ku aliyên demokratîk sazûman kirine û damezirandine, ku dikarin di vê mijarê de vînek xurt avabikin, ji holê rake. Wekî ku aloziya li Sûriyê ne bes be, ew şerê nû amade dike. Dewleta Tirkiyê û hevalbendên wê hewl didin ku di navbera Ereb û Kurdan de pevçûnê gur bikin û tovên dijminatiyên nû biçînin. Divê peywendiyên di navbera hikûmeta Tirkiyê û HTŞ’ê de wekî danûstandinên dualî di navbera du hêzan de neyê dîtin. Dema ku civîna Parîsê hat rojevê, wezîrê derve yê Tirkiyê tavilê çû Şamê. Dûv re wan wezîrên hikûmeta Şamê anîn Enqerê, ferman dan wan û neçar kirin ku peymanên ku ew dixwazin îmze bikin. Sûriye rojane ji hêla Tirkan ve tê birêvebirin. Divê gelê Sûriyê û hêzên ku ji bo demokrasî û azadiyê kar dikin vê yekê bizanibin…



## Fahmnekirina ji dayikên aştiyê

**Farûk Sakik**

Serokwezirê Almanya, Willy Brandt di sala 1970’an de li ber Bîrdariya Gettoya Varşovayê, ya ji bo cihûyên di şerê cîhanê yê duyem de hatibûn qetil kirin, hatibû çêkirin, çok da û lêborîna xwe xwest. Ev helwesta wî wekî sembola rûbirûbûna ji dil û daxwazek ji bo bexşandinê hat pênasekirin.
Li Tirkiyê, piştî ku serdema aştî û civaka demokratik hat destpêkirin, li Meclisê komisyonek hat avakirin û dest bi guhdarkirina mexdûr û aliyên şer kirin. Di vê hefta derbasbûyî de mêvanê wan ‘dayikên aştiyê’ bûn.
Dema dayikek xwest bi Kurdî biaxive serokê komisyonê Nûman Kûrtûlmûş midaxle kir û got ‘heger tu wisa biaxivî ev yek wê bandorek nebaş li ser pêvajoyê bike’. Her wek di dema Esat Oktay de li ser dîwarên zindana Amedê nivîsî bûn, “bi Tirkî biaxive pirr biaxive” bibîra mirovan dixist.
Her çiqas Meral Daniş Beştaş û Sezgîn Tanrikulu gotibûn em dikarin werger bikin jî, Nûman Kûrtûlmûş ev yek jî qebûl nekiribû.
Em nabêjin serokê komisyona Meclisê Nûman Kurtulmuş, wek Willy Brandt li ber dayikan, çok daniya. Bendewariyek me bi vî awayî tunebû. Lê ew dayikên ku ew roj mêvanên komisyonê bûn, diviya piçek nasbikira. Empatî bikira. Heger ber bi aştiyek an jî lihevkirinek biçî, divê bi du dermankirina wan êş û birinan bikevî. Wan birînan ji nû de xwunî nekî.
Numan Kûrtûlmûş diviya bizaniba ew dayikên wendahiyanin. Bizanibiya ku wan dayikan dema ku zarokên wan hatin revandin û wendakirin, bi salan boyaxa xaniyên xwe nû nekirin. Mala xwe barnekirin. Gotin rojek ku zarokên me vegerin, me li vî avahiyê bibînin.
Hin ji wan dayikan zarokên xwe di şerde wendakirin û cenazeyê wan nedîtin. Lê mezerek temsilî çêkirin û çûn li ser vê gorî gîriyan û dûa kirin. Li ber çavên zarokên wan, esker û polîsan bi rûmeta wan leîstin. Zarok li benda mezinbûnê nesekinîn û bi du rizgarkirina rûmeta dayika xwe ketin.
Numan Kurtulmûş jibîr kiribû li wê salonê, ev komisyon û ev dayik çima rûniştibûn. Ji bîrkirin ku zarokên wan dayikan, ji bo dayika wan azad zimanê xwe bijîn-biaxivin, şehîd ketibûn.
Mîsyonek vê komisyonê, li wê salonê ji bo qedexeya li ser zimanê Kurdî were rakirin lihev civiyabûn. Heger di destpêkê de ev komisyon helwestek weha nişan bide wê nebe bersiva hêviyên aştiyê. Rêber Apo di hevdîtinên herî dawî de bal dikişîne ser têkoşîna zimanê Kurdî. Bi taybet ji bo bibe zimanê perwerdehiyê têkoşînek bê navber daye pêş Kurdan. Ev dayik hinek jî bi vê hesasiyetê derbasî Komisyona Meclisa Tirkiyê bûbûn. Ev komisyon piştî muzekereyên Rêber Apo û ‘dewleta norm’ li ser demokratîkbûnê li hev kirin, hat avakirin. Ev Komisyon divê guhdarbike û ji bo çareseriyê kîjan gavên hiqûqî werin avêtin biryaran bigire.
Erdogan ji eniya ‘dewleta ne norm’ e. Dixwaze ji vê pêngava ku hatî destpêkirin sûd wergire û li gor berjewendiyên xwe tevbigere. Dîsa dixwaze ku vê komisyonê jî li gor siyaseta xwe bikarbîne. Heta dawiya salê ajandayek dane pêş komisyonê. Lê wisa dixwiye ku Erdoganê vê dîrokê dirêj bike. Di hilbijartinên pêş de bikarbîne. Pêvajo aktuele. Bi tenê di komisyonê de raboriya Tirkiyê were guhdarkirin, nabe. Divê nêrînên endamên komisyonê, di derbarê gefên li ser Rojava, êrişên li dijî CHP û şerê koalisyonê yê navxweyî jî hebin. Divê van rûdanên dawî midaxle bike, li ser pêngavê bandor neke, da ku pêngava aştî û civaka demokratik encam bigire.